Nergiz, gupik û çiçek ji her ali didih bîn
Di van rojên şîrîn de welatê Kurd ser û bin
Çi keç û xort û mendal kal û pîr ûbûk û jin
Dikincejin sê roja bi xweşî û ken û hang
Derdikevin ji maln bi xireşme qîr û bang
Tev bildigrin digel xwe nan û dan û şîranî
Hinek bi saz û sowet hinek bi ser giranî
cih cih li hev di civin keçên xweşik û dîlber
Hinek ji wan genimgûn hinek jê çûr gulîzer
Hinekêwan çav reşin kezî dirêj gewr û boz
Gihiştina destê wan divê gelek dawû doz
Li ber çem û çîmenan di nava bax û bustan
Dirivin û dikenin cîhan dibe gulistan
Li ser gul û çiçekan ew surperî weke hing
Her dadinin radibin têk re dikinvingeving
Dema ji wan diyarbin xortên çeleng û şe pal
Dibe pirkepirka wan didin çiman wek xezal
Dawî li hev dibanin vedgerin çend bi çend
Hinek dibên dîlokan dibe dîlan û govend
Bisk û zilfên zerîyan ji dûzanê bi der tên
Li ser dêm û rûyên gewr dipengizin dirin tên
Dilê xortan ji evîn tijî dibe dike coş
Bi nêhrîna zeriyan tev dibin gêj û serxoş
Kal û pîrên qermiçî ew her didin kesran
Demên borî dibîrin dixwazînin dîlberan
Lê çi fêde nayê dest emrê çûye carek din
Wekî gula çilmisî pelkê wê dikevin bin
Dilê xwe ê peritî bi hezringan daxdikin
Lê birîna bê derman bi xeyalan sax dikin
Dijwariyek mezine qesîya xwe bîrbirin
Bizan gelek kirête pir jê xweştire mirin
Hersê rojên cejna xwe derbas dikin bi başî
Tev kêf û saz û spwet reqs û dîlan û xweşî
Diva bû tistekî bêjin çende gotinan di Newroz
Zanîna min hinde bû gelo cejna te pîroz

Osman SEBRÎ, derdên me, rû. 17

---

Dûmayika rûpelê hebta (9)

Bi vê xwînrijandina han jî neyarên me têr nebûne û tirsa wan her ku çûye bêtir bûye.Vê tirsê xwe li ber çavên wan mezingiriye,xewa şevan li wan hexistiye nava me û bi vê siyaseta han daxwazên xwe tîne cî.Siyaseta Tirkan a mezin eve ku qasî ji destê wan tê Kurdan bikin dû sîpan û wek dîkan berrewşaxweyî ku tê dedijîn bifikirin.Gava ku hêlek bi vî awayî xistin qîma xwe pê nayenin û vê carê bi destê ê ketî digrin û berdidin ser yê din û vê carê ên din dikin qermelax(wek kewên gundan)û li ên berê bêtir pîsitiyê pê dikin.Ev nerindiya han rikê dibe dibe nava wan û bi navê heyfê hilanîne demeke dirêj domdike.Zarokên wan jî di bin wê barê dijminitiyê de dimîn hata demeke dirêj.Zorkerên me qîma xwe bi vê yeka han jî nayinin,rêya xwendinê jî li lawên Kurd digrin.Di dibistanan de zimanê me qedexeye.Ji roja siftê de zimanê wana turkiye.Heroj bi her û her berî her tiştî bi Zarokan goraniyên turkitiyê didin gotin(ez tirkim,ezî rastim,bav û diyên min tirkin) Ev Zarokana bi şovîniya tirkan ji 5-11 salan dixwînin û bi rastî jî ji wan gelek dibin Toranî.Gava ku dixwazin têkevin zanîningehan rêya wana tê girtin ji ber zanîgeh wê wana şiyarbikin û ji ber her tiştî zanîgeh di Kurdistanê de tunene û Kurd jî neçarin nikarin lawên xwe bişînin diyarên Rom.Hin ji vê giringtir jî ewe ku mamostayên (muelim)wêna bi cakî wana hîn nakin.Her dibistaneke Kurdistanê ên gundan mamostayekî xwe heya,ê bajaran jî bi ser bar-pêncan ve dikevin.Lê yek li ê bajarên Tirkan de 60-70 mamoste heye.Ev kemaniya mamostan jî xortên Kurd qels dihêlin.Gava ku yek her tiştî dide ber çavên xwe û dre zanîgehekê gereke ku imtihanekê ji xwedivanên din re bi de,ger ku bi serket dibe ku bikaribe bixwîne! Wek ku hûn jî dibînin divê em bi lêt xwe bi van nexweşiyên ku me bi hevdîn pîsdikin biflitinin û bi parêzînin.Eva jî bi yeketiya xebata bi hevre dibe.Yeketiya ji bo bi rêxistinekê (saze,organizatsiyon)bi nav dibe.Nik vê rêkxistinê jî bi hevdû û doza xwe bawerbûn gereke.Divê êdî em bi yeketiyê, wekheviyê bawerbin û qîma xwe pê bînin.

R E Ş O

---

J I  R E W Ş Ê N  Ş Û R E Ş A  M E

Di vî warîde,ev warê bê bihur,ku merov dikare bi dûr û dirêjî li ser bi peyive,ez dixwazim hinekî bi kurtî li ser hin tiştên bigehîn,ku bûne pasmêr ji destpêkirin,man û xurtubûna vê şûreşa me a pîroz,bipeyivim.

Pi rst û durûst bû,ku millet pewerên Kurd bi milletpewerên Ereb re katin cenga biratî,a paraztina komara 14 tîrmehê,ev komara,ku bi ser yeketiya xebata,herdû milletan ê Kurd û Ereb,hate dinê-ji bo bi cih kirin û pêvebirina mafeyên xwe ên millî.Lê heyf û mixabin,ku Qasim zû,nebes bi pasde vegeriya,lê bi bê mirovitî êrîş berda ser gund û malên Kurdan,piştî

